 *Dr. Sozdar Mîdî (E. Xelîl)*

 *wergera ji erebî: Mustefa Reşîd*


# Tîrêjên Çarşembê

## Xelek - 45

# Şopên Hûriyan di Kelepora Rojhilata Navîn da

## (beşê duwem)

Emê li jêr bingeha hûrî ya hin navên erdnîgarî li rojavayê Asiyayê bînin ziman.


## Yekem - navê Sûriya:

Me berê mijara peywendiya Sûriyayê bi Hûriyan ra di pirtûka "*Padîşahiya Mîttanî ya Hûrî*" da gengeşe kiribû, û encamên ku em wê hîngê gihîştibûnê bi behane û dawerên nû û xurt di lêkolînên piştî wê ra, bi gengeşekirina peywendiya navbera *Sûbarî* û *Aşûriyan*, piştrast kiribû, û her wisa di lêkolînên ku me derbarê ayîna *Mîtra (Mehir)* ya şemsanî da belavkiribûn. Em gihabûn van encaman:

**1 -** Ayîna şemsanî (rojeyî) li ba hemû pêşiyên Kurdan, hên ji dema sûmerî da, serwext bû. Di heyama mîtologiya destpêkî da, roj xweda bû. Bi pêşveçûna zanîn û hişyariyê û şiyana cudakirina navbera tiştên daringî û tiştên ramanî (razber) û xuyakirina destpêka ayînên bilind (*Yezdanî* wek nimûne), êdî roj bû sembola xwedayê gewre û yekane.

**2 -** Ji şêwazên navên rojê yên asayî li ba Ariyanên rojhilatî (ji nîveka bakurê Hindistanê da bigire heya bi Kurdistan û Asiyaya Biçûk jî di nav da) ev bûn (*Mihir, Mithra, Mîdra, Hûr, Xûr, Sûr*) û bi şêwazên xwe yên ayînî (*Mihir, Mîthra, Axûra, Ahûra, Asûra, Sûrya, Sûryaş*) bûn.

**3 -** Navê xwedayê şemsanî (*Sûr, Asûr, Sûrya, Sûryaş*) di çanda sûbarî, hûrî/mîttanî da serwext bû. Di lêkolînên derbasbûyî da me dît ku hên ji dawiya hezarsala sêhem b.z. da, kelîja hûrî ya çandî û siyasî ji başûrê Kurdistanê da heya Asiyaya Biçûk (nîvê rojava ji Turkiya niha), û heya kenarên Derya Sipî (nîvê bakur yê Sûriya niha jî têda), dirêj dibû.



(Pdîşahiya Mîttanî ya hûrî)

Dîsa bi me ra derbas bû ku dema Roman di sedsala yekem b.z. da Asiyaya Biçûk xistin bin destê xwe, li wê derê sê padîşahiyên kurdî hebûn - wek ku Mihirdad Izadi dibêje - ew jî padîşahiya Kapadokiya (*Cappadocia*), pdîşahiya Komagênê (*Commagene*) û padîşahiya Pontê (*Potus*) bûn, û ew ji alîgirên ayîna semsanî (*Mihir, Hûr, Sûr*) bûn.



(Asiya Biçûk)

**4 -** Aşûrî di bingehê da tevlihevin ji Sûbariyên Ariyanî (rûniştivanên Sûbartû) yên resen û ji Amûriyên biyabanî yên ku di sedsala 19-an b.z. da welatê Sûbartû talankirin. Navê Aşûriyan ji navê xwedawendê Ariyanî (*Asûr*) hatiye wergirtin. Ev Asûr xwedawendê niştîmanî li Sûbartû bû hên pêş talana amûrî. Ew wisa jî ma, lê belê nav hate guhartin û bû (*Aşûr*) li gor bilêvkirina akkadî-amûrî, bi guhartina tîpa "s" bo tîpa "ş" û hin dêlîndêzên xwdawendê babilî Mardox (*Mardok*) jî tev li mîtologiya xwedawend *Aşûr* bûn.

**5 -** Dema ku dîroknasên yûnanî (îxrîqî) agahdariyên derbarê gelên Asiya Biçûk, Mîttanî û bakurê Sûriya jî di nav da tomarkirin, navê (*sûrî, sûryan*) li wan gelan kirin; ew jî ji bo du sedeman: Yekem daku bidin nîşandan ku rûniştivanên wê herêmê alîgirên ayîna xwedawend (*Sûr* = *Asûr*)-in, û duwem daku bidin xuyakirin ku ew herêm di bin kelîja emperatoriya Aşûrî (*Assurian*) da ye.

**6 -** Nivîskarên yûnanî gelê Sûriyayê kiribûn du beş (Sûriyên gewr) - rûniştivanên Asiya Biçûk; bi taybetî jî yên Kapadokiya (*Cappadocia*), û (Sûriyên morik = esmer) rûniştivanên nîvê bakur ji Sûriyayê. Dema ku Roman bûn desthilatdarên weltaê ku niha bi navê (Sûriya,

Libnan, Filestîn û nîvê rojava ji Urdinê) tê naskirin, navê (wilayeta Sûriya) avêtin ser seranserê vê herêmê[1].

**7-** Di heyamên xilafeta erebî da navê (*welatê Şamê*) kete cihê navê (Sûriyayê). Niha derfet nîne ku em bi hûrbînî têkevin lêkolîna navê (*Şam*). Navê (Sûriyayê) di heyamên Selcoqî, Eyyûbî, Memlokî û Osmanî da wendayî bû. Di sedsala 19-an da, bi hatina şandên arkêologî û peywirdarî ewropayî bo Asiya Biçûk ev nav cardin hate vejandin. Li gor peymana Saykes-Pico ya sala 1916-an navê Sûriya avêtin ser dewleta ku niha heye.

Ev bû bi kurtahî rêwîtiya navê (Sûriya) bi dirêjahiya sê hezar sal ku di bingehê da navê xwedawendê sûbarî/hûrî (*Sûr* = *Asûr*) bû, û dawî bû navê welatekî erebkirî. Behane û dawerên vê yekê pirin. Me ev tişt bi berfirehî û bi belge di lêkolînên ku me derbarê Sûbarî, Aşûrî û Hûriyan, û ayîna Mîtrayî da belav kirine.

**Duwem - navê çemê Asê Ûrûntes (Orontes):** Ev çem ji komek çavkaniyan ji kuntarên zincîra çiyayên Libnan yên rojava û zincîra çiyayên Libnan yên rojhilat pêktê. Ew dikeve Sûriyayê û berê xwe di deştên parêzgehên Hums û Hemayê ra dide bakur. Di pey ra ev çem deşta Hemqê (başûr-rojavayê deşta Cûmê li herêma Efrîn - rojavayê Kurdistanê) derbas dike, bi çemê Efrîn ra ku ji rojhilat da tê û bi Ava Reş ra ku ji bakur da tê dibe yek, û bi hev ra li hinda perava Suweydiyê li parêzgeha Îskenderûnê (Turkiya niha) dirijin Derya Sipî.



(Çemê Ûrûnt = Hûran = çemê Asê)

Misiriyên kevin ji vî çemî ra (*Araunti*) digotin. Di hin jêderên yûnanî (îxrîqî) da bi navê (*Orontes*) hatiye gotin. Rûniştivanên makdonî yên li bajarê Afamiya (*Apamea*) navê (Axius) avêtine ser. Ev bajar li ber kenara çeme. Dibe ku ev nav û navê çem ji du navên li Balkanan hatibin wergirtin. Ev şop li ba wan naskirî bû. Bi erebî navê çem kirin (Al Asî العاصي). Ev ji erebkirina navê makdonî (Axius) hatiye û ne ji ber wê yekê ye wek ku hatiye belavkirin, ew bi vajayî çemên din yên Sûriyayê ji başûr ber bi bakur va diçe.

Di hin jêderan da hatiye ku navê vî çemî (*Orontes, Araunti*) nepenî ye (ne diyare). Lê belê heger me rastiyên erdnîgarî, demografî û çandî yên hezarsala duwem b.z. dan ber çavan, hîngê tê xuyakirin ku navê wî vedigere ser navê gelê (*Ĥûrî* = *Hûrî* = *Ûrî*) yê ku li ber kenarên wî dijiya. Me berê jî gotibû ku kelîja hûrî - demografî û çandî - di nîvê bakur yê Sûriyayê da

(heya bi Humsê) serwext bû. Di pey ra di heyama hûrî-mîttanî da bû kelîjeka siyasî di sedsalên (15, 14, 13 b.z.) da, nîvê bakur ji Sûriyayê beşek ji padîşahiya Mîttanî bû (me bi hûrbînî ev yek bi belge û daweran di pirtûka: *Padîşahiya Mîttanî ya Hûrî* da gotiye).

Li ser bingeha van rastiyên erdnîgarî, demografî û siyasî yên piştrast û li gor logîk, navê bingehîn yê vî çemî (*Orontes, Araunti*) ji navê Hûriyan (*Hûran = Ûran*) hatiye wergirtin. Wek tê zanîn, parkîta "an" di navan da, di zimanên Ariyanî rojhilatî da (kurdî jî di nav da), tê maneya gelejimariyê. Wisa navê (*Orontes, Araunti*) tê maneya (çemê *Hûran = Ûran = Hûriyan*). Di nava wergerandinê da şêwazê (*Oront = Aurant*) wergirtiye. Di rastiyê da, dema ku Misiriyan navê (*Araunti*) ji vî çemî ra gotine, nîvê bakur ji Sûriyayê - çemê Ûrant jî di nav da - di çarçewa padîşahiya Mîttanî/Hûrî da bû.

## Sêhem - navê Ken'anكَنعان :


Di hezarsala çarem b. z. da ew herêma ku niha jêra Iraq عِراق û welatê Şamê (Sûriya, Libnan, Filestîn û beşê rojava ji Urdinê) tê gotin herêmeka dijberî û keftelefta navbera gelên biyabanê ji bakurê Cezîra Erebî û gelên çiyayên Zagros û Torosan (pêşiyên Kurdan) bû. Li dor sala 2500 b.z. biyabaniyên akkadî gihîştin Îraqê û xizimên wan yên amûrî gihîştin welatê Şamê. Ew beşê ku li Filestînê bi cih û war bû bi navê *Ken'aniyan* كَنعان hate naskirin.

Ji baweriyên nû wisa tê fêhmkirin ku bingeha peyva (*Ken'an*) ne samî ye; yanê ew ne ibranî, ne amûrî, ne aramî û ne jî erebî ye. Ew peyveka di bingehê da hûrî ye (*Knaggi*); bi maneya boyaxvanê erxewanî[2]. Dîrokzan û mamostayê zimanên samî yê sûrî Dr. Ahmad Hibbo dibêje: "*nivîsên hûrî ji navê "Ken'an" ra "Knaggi*" dibêjin[3].

Dîrokzanê misirî Dr. Ahmad Fakhri dibêje:
"*Mamostayên lêkolînên samî hewldane ku bikin koka navê "Ken'an" ji bingeheka samî hatiye... Lê belê baweriya piraniya kesên ku niha bi van lêkolînan xerîkin û tê pejirandin ewe ku bingeha peyva Ken'an ne samî ye. Ew derxistina vê peyvê vedigerînin ser peyveka hindo-ewropayî (di zimaê hûrî da) ku tê maneya (boyaxa erxewanî - qirmizî). Ji ber ku ev herêm bi vê boyaxê navdar bû dema ku Hûrî di sedsala 18-an yan jî 17-an b.z. da gihîştin vê herêmê*"[4].

## Çarem - rêya Hûr ya gewre:

Dîrokzanê misirî Dr. Seyyid Al Qimni dibêje: "*Ji belgeyên Misirî em dizanin ku rêya şer ya gewre û navneteweyî ku diçe Filestînê bi navê* ***rêya Hûr ya Navdewletî Gewre*** *dihate naskirin*"[5]. Ev li navbera bajarê Gazayê li başûrê Filestînê û bakur-rojhilatê Misirê li nêziya kenara Derya Sipî dikeve. Ev rêya bazirganî û derbasbûna lêşkeran bû. Gelo ev tê çi maneyê ku rêyeka navneteweyî ya şer di navbera parzemîna Afrîka û Asiya da navê Hûriyan hilgire? Ma gelo ev ne nîşana wê yekê ye ku Hûrî bi hejmareka pir mezin li Filestînê hebûne û kelîja wan ya siyasî û bazirganî di wê demê da li wir hebûye?




(Rêya Hûr ya gewre li başûrê Filestî û bakur-rojavayê Misirê)

Çarşemb, 03.02.2016

## Jêder

---

[1] Sami Se'id Al Ahmad: Sûmerî, rûpel 29. Georg Marhi Hadad, vekirina Ereban ya Şamê, rûpel 6.
[2] Ahmad Al Dibish. Fer'ewn û Mûsa li Cezîra Erebî, rûpel 74-75.
[3] Ahmad Hibo. Dîroka rojhilat ya kevin, rûpel 105.
[4] Ahmad Fakhri: Lêkolîn li dîroka rojhilat ya kevin, rûpel 107, nîşe(1).
[5] Seyid Al Qimni: Pêximber Mûsa û rojên dawî yên Til Amarna, rûpel 217.